


04

Çîroka Newrozê

Şivan Perwer





Yek ji projeyê Ararat Groupê ye.

Birêveberîya projeyê:

Silêman Osman - Raman Hesê

Edîtor û sererastker:

Ara Zarok

Nîgar:

Mamoste

Dîzayin û amadekarî:

Mihemed Osman

Hesan Mihemed

Şînda Ekrem

Cûdî Elî



Weşanxaneya Şîlêr, Qamişlo

weshanashiler@gmail.com

www.shlier.info

Çapa yekê

Köln 1990'ê

Çapxaneya APEC

Çapa duyê

Qamişlo 2022'ê

Çapxaneya Şehîd Herekol, Dêrik



+963 989 966 863



@arazarok.online



Ara Zarok



@arazarok_online



@arazarok.online



zarok@arasat.online

©Hemû maf parastîne.

www.arasat.online/zarok



Hebû tine bû. Welatek hebû, navê wî Medya bû.
Medya welatekê bi dar û ber, gul û rihan bû, çemên wî fireh,
çiyayêñ wî bilind, welatekê azad bû.
Roja wî xweş, gelê wî rûgeş û serbilind bû.

Medya me pir şirîn e
Tev da mîrg û kanî ne
Cihê dapîr û kalan
Her tîm jî bo me evîn e.

Belê, gelê vî welatî dapîr û bavpîrêñ me Kurdan bûn,
lê dîlxwêşî û kêfxwêşîya vî welatî pir neajot.

Ewrêñ reş û tarî bi esmanê vî welatî ketin. Kêf û evîn bû girî û şîn.
Gul û rihan çîlmişîn.
Êdî roja Medyayê jî ber çîyan melûlmelûl û bi dîlşewat hildihat.
Ma gelo çi bûbû?



2



"Haha ha haaaa hhahaaaaaaaaaa.

Dehak im, Dehak! Dehakê qiral.

Ez ê rakim şûr û mertal

Ger ez werim xezebê

Tî car nadim we mecal

Ez Dehak im, Dehak im

Li we fermanê rakim

Bi 'esker û marên xwe

Mala we tev xerab kim!"







Dehak mirovekê zalim, bêbext û xedar bû. Bi darê zorê xwe kiribû qiral.
Malên gel talan dikir, keda wan dixwar.
Zarokên wan dibir û ji xwe ra dikir leşker û xizmetkar.

Gava dê û bav zarok nedana, Dehak dest bi kuştinê dikir û mala wan
dişewitand.

Dehak got: "Bînin, bînin! Ji min ra zarokan bînin!
Bînin, zarokên Kurdan bînin! Bila zarokên Kurdan nexwînin, nebin
mirovêñ baş.

Ez dewleta Kurdan naxwazim. Bila Kurd azad nebin.

Bila bindest bin. Haa haaaa, ha.

Ez im, ez qiral im, ez serdar im, serok im, mezin im, kî kare serê xwe li
ber min rake?!

Haa.. haaaa.. haaa"





Zarokekî got: "Ez naxwazim bibim leşkerê Dehak.

Dehak pir pîs e dayê, nahêle em bilîzin, yarîyan bikin, bixwînin.

Nahêle em ji dê û bav û ji heval û hogirên xwe hez bikin.

Nahêle em bi welatê xwe şâ bibin.

Dehak an me dikuje yan jî ji xwe ra dibe."

Dayikekê got: "Netirse kurê min, hindik maye. Wê roja me jî bê.

Li hember vî zalîmî wê mîrxasek der bikeve!"





Belê; li vî welañî mîrxasek hebû, her li hember zaliman bû.
Mîrxasek bi rîk û gir ku hêrsa salan bi hesin diheland.
Lepêñ wî bûbûn wek gurzan, zend û bendêñ wî bûbûn wek
mertalan, dîlê wî bûbûn wek çûyayê Herekolê. Zana, jîr û mîrxas
bû. Navê wî Kawa bû.

Esmanê me bi reş e
Gelê me dîlnexwêş e
Ey Kawa heta kengê
Zîlm ê li welat bimeşe?
Lîyan e dîl lîyan e
Sebr û seman nemane
Ey Kawayê Hesinkar
Zar û zêç me nemane!







Gava Dehak vedixwar dîn û har dibû. Jana zîlmê li serî dixist.

Her du marên xwe dida kêleka xwe, bi leşkerên xwe dadiket nava gund û bajaran. ci diket pêşîya wî; talan, xerab û wêran dikir.

Dema çavêن zarokan li Dehak diket, ditirsiyan, dev ji lîstik û xwendina xwe berdidan, direvîyan diçûn çolê. Hinekan jî xwe diavêtin himêza dayîk û bavên xwe, lê dîsa jî jî destêن Dehakê devbixwîn nedifilitîn.





"Ez Dehakê qiral im
Bi leşker û bi mar im
Ên zarokan nedin min
Ez bi wan ra neyar im
Ha haa haaa haaaaa
Zarok marokên Kurdan
Dibêjin kurên merdan
Serî li ber min ranekin
Agir dixim her deran
Leşkerino herin ser wan
Bistînin ji dê-bavê wan
Ji bo min û marêñ deq
Bînin hemû zarokan."





Gava ku Dehak mar û leşkerên xwe berda ser zarokan, **dayikeka Kurd** der
ket meydanê û qîriya:

"Hey Kurdên belengaz
Em mane bê ser û saz
Dehak zarokan dibe
Çawa em bibin xelas?
Tu Dehakê zilimkar
Tu bi leşker û bi mar
Em ê rojikê bibînin
Tu yê bimînî bêçar
Ez dayikeka Medya me
Ti car ez neqediyame
Tovên min hîn gelek in
Di axê da jîn dame!"



Çiroka Newrozê

Kawayê Hesinkar rewş didît, lê bi sebir, bêhinfirehî û bi rîk difikirî.

Wî dixwest ku zarokên Kurdan bi hêz bin, yekîtiyekê çê bikin ku karîbin rojekê
Dehak bixînin û dawîya zilm û zordestîya wî bînin.

Dîkana Kawayî tijî gîsin, das, misas, tevir, bivir, kuling û bêr bûn, lê Kawa di
dîkana xwe da şûr û mertal, xencer û xiştik, tîr û kevan, gurz û çakûç jî çê dîkir.

Zarokekî got:

"Kawa tu kalê me yî
Ronîya çavên me yî
Dehak koka me rakir
Ma tu li hêviya ci yî?"

Dayîkek:

"Ji bo ci şûr û mertal?
Ey kurê Zerdeşte Kal
Dehak Medya şewitand
Bo ci didî wî mecal?"

Kalekê Kurd got:

"Ey kurê min i Kawa
Ez nizanim bi ci awa
Tu vê zilmê dibînî
Divê Medya bê ava!"

Dapîrekê got:

"Min we bi şîrê xwe mijand
Bi hêsiрen çavan hejand
Hûn ji bo ci sekinîne
Dehak laşê me pijand."

Cotkarekî got:

"Cotkarekî bi kîn im
Zikê erdê diqelşînim
Bi wî gîsinê te çê kir
Tovê jînê diçînim!"

Zarok bi hev ra gotin:

"Em in zarokê Medya
Em in hebûna Kurdan
Zilima Dehak hilînin
Da ku em nebin winda."



Çiroka Newrozê

Kawa hêdî hêdî ji dikana xwe der ket û
ber bi gel ve meşîya.

Gel ji der û dor, ji çar alî dihatin.

Çi qas diçû hejmara gel zêde dibû.

Zarok, keç, xort, dayik, bav, jin, mîr, kal,
pîr; yek bû deh, deh bû sed,
sed bû hezar û deh hezar.

Cotkar bi misasan, nêçîrvan bi tîrkevan
û riman, xort bi şûr û mertalan, pîr û
kal bi dar û gopalan, zarok bi çetelan li
dora Kawa kom bûn.

Kawa der ket ser dîwarekê bilind.

Çavêwî wek çavêwî pîlingen diçirisîn.
Bi koloz, şal û şapîk bû. Rih û simbêlên
wî weke ên şêran bûn.

Kawa bi heybet, çakûçê xwe da ser milê
xwe, kulma xwe bilind kir, sîlav da gel û
got: "Zarokino, birano, xwişkino, dayik
û bavino!

Li mîrga me dilîzin

Gur, çeqel û rovî

Li qada me dîbezin

Mar û Dehak bi hovî

Me dît Dehak ci dikir

Bi salan me sebir dikir

Bi xebat, bi dîl û can

Îro me xwe hazir kir

Kawa Kawayê we ye

Bê we Kawa tîne ye

Werin em dest bidin hev

Pêşîya me ronahî ye!"



Gel got:

"Tu Kawayê Hesinkar
Tu zana û tu rêbar
Em bi te serbilind in
Tu yî rêber û serdar
Medya welatê me ye
Yekîti karê me ye
Va ye me xwe hazir kir
Êdî Dehak tine ye!"

Piştî van gotinan, kêfa gel xweş bû.

Zarokan yarî kirin, xwe avêtin himêza Kawa û pê şâ bûn. Kal û pîran destêن xwe di ser ra birin, keç û xortan ew maçi kirin.

Gel bi hev şêwirî. Bû pistepista zarokan:

"Edî Dehako nîkane me bibe."

"Em ê bi kêfa dilê xwe bilîzin, yarîyan bikin,
bixwînin."
"Bijî Kawa!"

• • •

Dilê Kawa şâ bû. Kawayê mîrxas û bi rihê gernasan vege riya dikanê. Xortan pifîni bi kûrikê xistin, kûre sor bû, agir geş bû. Du xortêن wek Ristemê Zal hesin xistin nava êgir. Hesin sor bû, kelijî û taw girt. Rakirin danîn ber Kawa. Kawa çakûç xiste nava lepêن xwe yên mezin, bi wan zend û bendêن pehlewanî hesin da ber derban.

Di demeka kurt da gurzekî bi teqil der anî û danî ber xortan.

Kawa berê xwe da gel û bang kir: "Hevalino, hogirino! Bi salan e ku me ji bo vê rojê tîr û kevan, şûr û mertal, rîm û gurz, xencer û xiştik çê kirin. Îro roj, roja xebatê ye.

Welat bê xebat û bê lebat rizgar nabe. Divê em yekdest û yekmil bin!



Hevalino! Hûn dizanin Dehak îro jî avêt ser gund û bajaran.

Zar û zêç tev birin, mal talan kir. Lê min bihîstiye ku Dehak dixwaze îşev vê zîlim, zordarî
û talana xwe pîroz bike.

Piştî her talanekê li quesra xwe şahîyê çê dike. Ew û leşkerên xwe dixwin û vedixwin,
serxweş û sermest dîbin.

Ev jî ji bo me keyseka mezin e ku em bi hêsanî êrîşî ser qesrê bikin.
De rabin em bi rê bikevin gelî 'egid û mîrxasan."

Di destpêka şevê da; xorî bi şûr û mertal, pehlewan bi gurz û xencer, mîrxas bi tîr û
kevan, ber bi quesra Dehak ve meşyan. Berî roj bîhile xwe gihandin ber qesrê. Kawa
hemû pehlewan, mîrxas û gernasên xwe li hawirdora qesrê bi cih kir.

Paşê bang çend hevalên xwe kir û got: "Gelî hevalan; divê ku yek ji me tê bikeve hundirê
qesrê, li rewşa hundir binihêre û derîyê mezin vebike.

Kurekê Kawa hebû. Piçûk bû. Navê wî Jîr bû. Weke navê xwe zîrek û biaqîl bû.
Ew jî bi bavê xwe ra bû.

Jîr xwe avêt pêş û got: "Bavo! Destûrê bidin, ez ê biçim hundir.
Ez piçûk im, kes bi min nahese."





Pîr û kal qîriyan:

"Kawa! Kawa ev hîn zarok e!"

"Ma qey em mirine!"

"Jîr; ev ne karê te ye!"

"Kurîk mîrxas e!"

Kawa: "Na gelî hevalan, ev karekê dilsozî û dîlxwazîyê ye.

Heger Jîr dixwaze bila here. Jîr jîr e."

"De tuzanî Kawa!"

"De baş e"

"Bijî Jîr!"

"Rêya te vekirî be Jîr!"

"Bijî mîrxasê piçûk!"



Kêfa Jîr gelekî hat. **Kawa ji Jîr re got:** "Mêze bike kurê min; hay ji xwe hebe. Şâşîyek dîkare bibe sedema têkçûna jîyana te. Niha em ê werîsekî bi çengel biavêjin ser dîwarê qesrê.

Tu yê pê ve hilkişî û herî jor. Paşî di kuleka qesrê ra dê tê bîkevî hundir. Baş temaşe bike, xweşîk binhêre kî li ku ye û çi dîke. Pişt ra çengela derîyê qesrê veke. Baş e?"

Jîr got: "Baş e bavo! De ka hûn min hildin jorê." Jîr hilkişîya jorê. Li ser dîwarê qesrê li derdora xwe nihêrî. Nobedaran mey vedixwar, serxweş bûbûn, ji xwe ra stran digotin.

Bi Jîr nehesîyan. Jîr xwe berda nava qesrê. Dehak li gel mar û leşkerên xwe kûpê meyê bi ser serê xwe da dadikir. Mar rabûbûn lotikan, leşkeran jî govend digerand.

Di nav lemelem, xurexur, hirehir û fişefîşa serxweşan da, **dengê Dehak bîlind bû:** "Bînin, birrrrrr ji min ra zarokên Kurdan bînin... Zirrrr, xurrrr, fişssss!

Jîr di ber xwe da got: "Erê erê, tu bike fişefîş û birrebir, tu yê bibînî zalimê pîs! Mar jî nikanin te xelas bikin."



Çiroka Newrozê

Jîr hat pişt derîyê qesrê, bi tilihên xwe yên piçûk çengela mezin û qerase bîlind kir.

Pişt ra çû ser qesrê, nîşan da bavê xwe.

Kawa got: "Aferîn Jîr, hey tu her hebî!"

"Bijî Jîr!"

"Tu çavê min î!"

"Kurê mîrxasan mîrxas in."

Kawa da pêşîya gel êrîşî qesrê kirin.

Kawa xwe yekser gihand cihê Dehak û got:

"Ey Dehakê zîlimkar

Bi wan her du marêñ har

Te zar û zêçan qir kir

Mala me kir tar û mar

Bi teqla çakûçê min

Hêz distîne dilê min

Êdî qediya zilma te

Bila bijî gelê min!"



Çiroka Newrozê

Dehak ji cihê xwe veciniqî. Hew nihêrî ku Kawa bi çakûçê xwe li ser serê wî sekiniye.

Marên Dehakî li erdê ji tîrsan dîlerizîn.

Dehak got: "Min kir tu neke! Ez guneh im, ez pepûk im, ez reben im.

Zarokên min sêwî nehêle!"

Kawa: "Sêwî haa! Zarokên te zarok in, gelo ma yên Kurdan ne zarok in ha? Marên pîsên deqdeqî, tu hîn behsa zarokan dikî?! Yêh hevalmar, tim û tim dîbin negar.

Te zar û zêç bi me ve nehişt.

Zilimkarê xeddar. Em dest nadin zarokên te, ew ê bi zarokên me ra bîlîzin û şâ bibin."

Kawa çakûçê xwe biliind kir û avête Dehaq.

"A ji te ra, de bixwe! Ev ji bo zarokan, ev ji bo dayikan, ev ji bo pîr û kalan...!"

"Ax, offf, ez mirîiiim, kanîn marên mîiin, kanîn leşkerên min?!"

Lê ne mar û ne jî leşker bi hewara Dehakî ve hatîn.

Jîr çû serê qesrê agirekê mezin vêxist.

Bi agirê Jîr ra; li çar alîyênen welatê Medan agirê kêf, şahî û azadîyê biliind bû.



Roja 21'ê adarê bû
Dem hat dewran guherî
Navê Medya bû Kurdistan
Agirê azadîyê her maye li serê çîyan
Roja me ya nû hilat
Vêbixin agirê felat
Ji wî welatê Medya
Newroza me bi xêr hat
Newrozcejna Kurdan e
Dîroka wê ji Medya ye



Her sal em ê pîroz bikin
Serfirazîya Kurdan e
Medya bûye Kurdistan
Îro ketiye bin destan
Dehakên nû li me rabûn
Xelas bikin jî bin destan
Newrozcejna Kurdan e
Dîroka wê ji Medya ye
Her sal em ê pîroz bikin
Serhîldana Kurdan e.





Me ev çîrok ji warê mezinan anî warê piçûkan. Di gel kêmâsiyan; cara pêşîn e ku
Çîroka Newrozê bo zarokan tê amadekirin. Em hêvîdar in zarokêne me pê kêfxweş
bin û bi dilê wan be.

Her wiha li vê derê em spaşîya nivîskarên Kurd M.Baksi û M.Lewendî dîkin ku di
amadekirina vê pirtûkê da alîkarîya me kirin.

Şivan Perwer
1990



ARA ZAROK

Çêja jîyîna zarokêni Kurdan e!

